



Yekbûn INFO

Hejmar: 6, 24.05.1994

Adres: Box 7007
171 07 Solna-SWEDEN
Fax: 46-8-580 36440

Bultena Rêxistina Ewropayê ya Partiya Yekbûyî ya Gelê Kurdistanê

YEKBÛN BÛ DUSALÎ

Ew gava di rêya yekîtiya sosyalîstên Bakurê Kurdistanê de ku di havîna 1992'yan de hatibû avêtin, bû dusalî. Ew gava ku di dîroka siyaseta Kurdan de, ji gavên ku rêxistinên Kurdan heta wê rojê di hewildanên xwe yên ji bo avakirina yekîtiyan de ceribandibûn, pirtir cuda hatibû avêtin û YEKBÛN ava kiribû, bû dusalî. Û iro piştî du salan, hêviya ku YEKBÛNê bi xwe re avakiribû ji bû dusalî.

Ew hêvî iro mezintir e û ne ya xebatkarên YEKBÛNê bi tenê ye. Iro bi hezaran Kurd piştigiriyê didin YEKBÛNê û hêvî û pêşeroja xwe di YEKBÛNê de dibînin. Iro dema YEKBÛNê dibê dusalî, endam û xebatkarên wê yên nû, ji yên destpêkê pirtir in. Ev rûmet, a hemû endam û piştgirên YEKBÛNê ye.

YEKBÛN, ne hew bi xwestina hinek mirovan, ya jî çendî hêzên ji heydû cuda bûn, hat avakirin. YEKBÛN, ne navê encama aritmetîk a sê(3) hêzan e. Sedem û bingeha avabûna YEKBÛNê, hewcedariya têkoşîna neteweyî û demokratîk ya Bakurê Kurdistanê û hîcîhanîna berpirsariyên ji bo çareserkirina wê ye. YEKBÛN, encama tesbîtkirina pêwîstiyên têkoşîna neteweyî û demokratîk ya Kurdan e. Ew encama fedekariyên mezin e. Di pêvajoya iro de, navê pêwîstiyekê ye. Û iro piştî du salan, bûye navê hêviyekê. Loma jî gelek welatperwerên ku wê pêwîstiyê bi awayekî êskere dibînin, xwe li YEKBÛNê digirin, YEKBÛNê xurtir dikin.

Her sê hêzên ku bûn bingehên YEKBÛNê, heta sala 1992'yan, ji bo pêydekirina rêya avakirina yekîtiyekê, bi fedekariya welatperwerî û danûstendinan, gelek astengên programatik çareser kiribûn. Tiştê ku mabû, avêtina gava dawîn; avakirina partiyêke yekgirtî bû. Dema kongreya hevbeş civiya, ji bo beşdarîna tiştek pirtir êskere xuya dikir. Ev jî, pêwîstiya bi yekbûnekê bû. Ji ber ku pêydekirina îmkane avakirina yekbûnekê, di rêya bidestxistina mafên neteweyî demokratîk de qonaxêke girîng bû. Ji beşdarîna kongreya hevbeş,

Damahir: r.11

Dîsa Şerê Birakujiyê

Komîteya Pêwendiyên ya RNK/KUK, TSK û YEKBÛNê bi munasebata şerê birakujiyê ye ku li Başûrê Kurdistanê di navbera herdu hêzên mezin PDK-Yekgirtin û Yekîtiya Niştimanî Kurdistan de hate holê, civiya û şer, wek helwesteke li dij berjewendiyên tevgera rizgariya neteweyî û demokratîk nixand û lênerîna xwe ya li ser vî şerî, ji bo raya giştî bi daxuyaniyekê diyar kir. Yekbûn-Info wê daxuyaniya muştêrek ya hersê hêzan, ji bo xwendevanan di rûpela 8'an de diweşîne

rûpel: 8

Dusaliya YEKBÛNê hat pîrozkirin

Rêxistina Yekbûnê ya li Swêdê li gor biryara Rêxistina Ewropayê, di 13.05.1994-an de, li bajarê Stockholmê li "Konserthusetê" du saliya Partiya Yekbûyî ya Gelê Kurdistanê pîroz kir.

rûpel: 2

Di warê yekîtiya sosyalîstan de gaveke girîng

Partiya Yekbûyî ya Gelê Kurdistanê-Yekbûn, Rizgarîxwazên Neteweyî yên Kurdistanê (RNK/KUK) û Têvgera Sosyalîst a Kurdistanê (TSK) piştî danûstendineke dîr û dirêj li ser prensîpên awa û karaktera yekîtiya siyasî û rêxistinîyê, li hevdu kirine. Li gor agahdariyên ku ji delegasyonên hersê hêzan hatin wergirtin, hersê hêz dê xebatên xwe yên pêşerojê di bin ronahiya van prensîpan de bimeşîne û ji bo amadekirina şertên pratîk yên yekîtiyê, dê di her sewiyeyê de xebatên muştêrek amade bike. Hersê hêzan ji bo pêkanîna mercên ku di daxuyaniya encama danûstendinan de ji hatine diyarkirin, komîsyoneke hevbeş damezrandine.

rûpel: 4

Têkoşîna neteweyî û demokratîk ji bo bidestxistina desthilata siyasî ya li welatê me ye

Ma ger pirs, ne pirs a îktidarê be, gelo em ji bo çî yekîtiya hêzên welatparêz dixwazin? Ma gelo têkoşîna neteweyî û demokratîk ne ji bo bidestxistina desthilata siyasî ya li welatê me ye? Ma divê ev desthilata siyasî çih nede hemû hêzên welatparêz yên Bakurê Kurdistanê? Ji ber ku bersivên Partiya me ji bo van pirsan pozîtîv in, em li pirs a Cepheyê jî wek ku li jor hatiye diyarkirin, dinêrin.

rûpel: 6

Cografyaya têkoşîna siyasî tuneye

Têkoşîna îktidarê li welatekî weke Kurdistanê û li civateke weke ya Kurdan, ne tiştên abstrakt (soyut) in. Pêwîstiya têkoşînê, bi kadro, bi malîyeteke xurt, bi dezgehên agahdarî û propogandayê, bi piştgirî û alikariya navneteweyî heye.

rûpel: 9

Di warê yekîtiya sosyalîstan de gaveke girîng

Partiya Yekbûyî ya Gelê Kurdistanê-Yekbûn, Rizgarîxwazên Neteweyî yên Kurdistanê (RNK/KUK) û Tevgera Sosyalîst a Kurdistanê (TSK) piştî danûstendineke dûr û dirêj li ser prensîpên awa û karaktera yekîtiya siyasî û rêxistinîyê, li hevdu kirine. Li gor agahdariyên ku ji delegasyonên hersê hêzan hatin wergirtin, hersê hêz dê xebatên xwe yên pêşerojê di bin ronahiya van prensîpan de bimeşîne û ji bo amadekirina şertên pratîk yên yekîtiyê, dê di her sewiyeyê de xebatên muştêrek amade bike. Hersê hêzan ji bo pêkanîna mercên ku di daxuyaniya encama danûstendinan de jî hatine diyarkirin, komîsyoneke hevbeş damezrandine. Ev komîsyon dê li gor çarçoveya van prensîpan, pêşniyara program û destûrekê amade bike û pêşniyarî organên bilind yên hersê hêzan bike. Em li jêr, ji bo xwendevanên "Yekbûn-Înfo"yê daxuyaniya hersê hêzan diwêşînin. **Yekbûn-Înfo**

TESPÎTÊN HEVBEŞ YÊN LI SER AWA Û KARAKTERA YEKÎTIYA SIYASÎ Û RÊXISTINÎ

Welatê me Kurdistan di vê dema dîrokî ya ku ber bi salên 2000-î ve diçe de, hê jî çar perçe ye û statuya wê ya mêtîngehî berdewam e. Neteweyê Kurd bi rastiya xwe ya perçekirî û bi bêparmayîna ji mafên xwe yên neteweyî û demokratîk ve, yek ji wan numûneyên ku li dinyayê pîr kêm tê dîtin e.

Ev rewşa hanê ji bo neteweyê Kurd ne qedereke dîrokî ye. Ev zêdeyî sed salî ye ku gelê Kurd ji bo azadî û serbixwebûna xwe têdikoşe. Ev têkoşîn îro jî, li her çar perçeyên Kurdistanê bi awa û sewiyeyên cûda berdewam e.

Gelê me li Başûrê Kurdistanê berbanga azadîyê bi dest xistiye. Ev bûyer, ji aliyê ci-

vakî û dîrokî ve hem ji bo îro û hem jî ji bo pêşeroja neteweyê Kurd

bûyereke gelek girîng e.

Li Bakurê Kurdistanê Komara Tirkiyeyê ya mêtîngehkar zulm û zordariya xwe ya li ser gelê me gihandîye qonaxa şerêkî giştî. Têkoşîna gelê me teva vê yekê jî ranewestiyaye û gihastîye qonaxeke nû. Di vê qonaxê de, tevgera neteweyî welatparêzên ji hemû cîh û tebeqeyên civata me li dor xwe dicivîne û berfireh dibe. Teva ku di nava refên tevgera neteweyî de rewşeke zêde zelal nehatiye holê jî, her aliyê civatê dixwaze bi hêjayiyên xwe yên siyasî û bi hewildanên xwe yên li gor van hêjayîyan ve beşdarî vê pêvajoyê bibe. Bê guman di nava refên tevgera rizgarîxwaziya neteweyî de, ji hêzên ku armanca wan "Kurdistanê serbixwe, demokratîk û yekgirtî" ye bigre, heta ew derdorên ku bi tenê hinek mafên neteweyî û demokratîk dixwazin, cihê hêmu hêz û hawîrên welatparêz heye û divê hebe. Di pêvajoya têkoşîna neteweyî de, damezrandina rêxistinê û xwe bi awayê siyasî

îfadekirin û temsîlkirin, mafekî xwezayî ye her aliyê civata me ye. Hêzên welatparêz, şoreşger, demokrat û sosyalîst di bin tîn û tesîra bûyerên hem li herêmê û hem jî li dinyayê rû didin de jî, ji aliyê îdeolojî, siyasî û rêxistinîyê ve ber bi refbûneke nû diçe. Ev hemû rûdanên girîng in. Divê encamên ku dikare ji ber van bûyeran derkevin holê, ji niha ve bêne dîtin.

Di vê qonaxa nû ya tevgera rizgariya neteweyî ya Bakurê Kurdistanê de, roleke dîrokî dikeve ser milên hêzên sosyalîst, ew kesên ku hevîya xwe bi wan ve girêdane û yên ku berjewendiyên xwe di hevalbendîya wan de dibîne. Ev pêvajoya ku em tê de dijîn, ji bo van hêzan pêvajoyeke ku bi berpirsiyarî û vatîniyên nûh ve dagirtî ye. Ji bo şoreşa Bakurê Kurdistanê bikaribe di rêyê rast, bi îstikrar ya li ser bîngehê berjewendiyên kedkaran de pêş ve biçe, divê ev hêz ye-

Yekîtiya me dide diyar kirin ku ew di nava tevayîya tevgera neteweyî û demokratîk ya Bakurê Kurdistanê de mîratxurê dîrokî ye van tevgerên ku vê yekîtiyê pêk tîne ye. Ji ber vê yekê, armanca me, bi awakî rexnegirî lêhûrbûyîna perspektîvên siyasî, strukturâ rêxistinî û têgihîştina têkoşîna me ya wê demê ye; bi tecrube û zanabûna îro ve rapêçandina dersên ku ji vê nîrxandîna bîr derxistin û bi vî awayî pêkanîna sentezeke nûh e.

kitiyên xwe yên siyasî û rêxistinî pêk bînin û di nava tevgera neteweyî de alternatîfên xwe yên bersivdar derxînin holê û bi vî awayî mudaxele yî pêvajoyê bikin.

Kadir û hêzên sosyalîst yên ku di nava grûp, rêxistin û partiyên cûda de cih digrin, teva ku potansiyeleke berfireh pêk tînin jî, belavbûyî ne. Ji ber vê yekê jî, ew ne di wê rewşa ku bikaribin li ser bîngeheke radîkal û bi awayeke hîn bi tesîr mudaxele yî pêvajoyê bikin de ne. Divê kadir, hawîr, grûp, partî û rêxistinên ku bawerîya xwe bi sosyalîzmê tînin û bi vê perspektîfê li tevgera rizgariya neteweyî ya Bakurê Kurdistanê dinerin, li ser binhehê programeke hevbeş bîr ba hev û yekîtiya xwe ya rêxistinî pêk bînin. Ev berpirsiyariyêke dîrokî ya ku ev pêvajoyê li ser me ferz dike ye. Divê hêzên sosyalîst bibin xwedî statuyêke bi tesîr û mudaxeledar û programa salên 2000-î

çêbikin.

Rêxistinên me bi vê bîr û bawerîyê hatin ba hev û ev demek e ku gotûbêjan dikin. Di encamên van gotûbêjan de, rêxistinên me li ser van xalên ku wê bibe bîngehê yekîtiya me ya siyasî û rêxistinî li hev kirine:

1) *Rêxistinên me, armanca damezrandina yekîtiyêke siyasî ya nûh ku ji sosyalîzmê bawer dike, xwe dispêre çîna karker û kedkaran û berjewendiyên wan bîngeh digre, daye pêşîya xwe. Yekîtiya me, îfadeya hûnandîneke nûh ya ku armanca wê li Kurdistanê bicihanîna vatîni û berpirsiyariyên bîngehî û dîrokî ye; angoyê pêkanîna rizgariya neteweyî û avakîna civateke demokratîk e.*

2) *Yekîtiya me ya siyasî teva ku li gor vê çarçoveya li jor hatiye nivîsandin, damezrandina partiyekê kiriye armanca xwe jî, lê awa, birêvebirin û hedefên programê dê di bin ronahiya sewiyeya*

çandî, civakî û aborî ya Bakurê Kurdistanê; rewşa perçebûna welatî, neteweyî û pîrsên ku bi vê ve girêdayî;

hoyên taybetî yên tevgera me ya rizgariya neteweyî; mercên navneteweyî; pêwîstî, zanabûn û tecrûbeyê ramanî û maddî ya civata me de bê tespîtîkirin.

3) *Yekîtiya me dide diyar kirin ku ew di nava tevayîya tevgera neteweyî û demokratîk ya Bakurê Kurdistanê de mîratxurê dîrokî ye van tevgerên ku vê yekîtiyê pêk tîne ye. Ji ber vê yekê, armanca me, bi awakî rexnegirî lêhûrbûyîna perspektîvên siyasî, strukturâ rêxistinî û têgihîştina têkoşîna me ya wê demê ye; bi tecrube û zanabûna îro ve rapêçandina dersên ku ji vê nîrxandîna bîr derxistin û bi vî awayî pêkanîna sentezeke nûh e. Ji ber vê sedemê jî, divê yekîtiya me di têkoşîna rizgariya neteweyî de mîna afirandin û dinamîzmeke nûh bê dîtin.*

4) *Rêxistinên me di vê bawerîyê de ne ku ew dê di warê prensîp û hedefên bîngehî de yên ji bo yekîtiya siyasî û rêxistinî, bikaribin bîgêhîjin hevdu. Teva*

Di xebata yekîtiya siyasî û rêxistinî ya sosyalîstan de qonaxeke nuh

vê yekê jî, rêxistinên me bawer dikin ku eger di warê îdeolojîk- siyasî de noqteyên cuda derkevin jî, ev noqtana dê di pêvajoya pratîk ya geşbûna yekîtiyê û di platformên hevbeş yên ku wê bibe îfadeya huqûqî ya vê yekîtiyê de çareser bibin.

5) *Li gor baweriya rêxistinên me, teva ku bingehê yekîtiya siyasî û rêxistinî lihevkarina li ser program û destûrê ye jî, ev bi serê xwe tenê têrê nakê. Ji ber vê yekê, ji bo ku endamên me di pêvajoya yekîtiya siyasî de di nav hev de bihelin û bibin yek, divê xebatên pratîk di her sewiyeyê de nêzîkî hevdu bibin. Em dê ancax bi vî awayî bikaribin di avahiyeke siyasî ya nuh de sentezekê pêk bînin û bighêjin yekîtiyeke organîk.*

6) Em dixwazin bi taybetî diyar bikin ku yekîtiya siyasî - rêxistinî û xebatên ku bi vê armancê ji aliyê me ve hatiye dest pê kirin û zemîna erîni ya ku îro peyde bûye, bi me tenê ve ne sinorkirî ye. Di vî warî de vatîni û berpirsiyariyên dîrokî dikevin ser milên hemû hêzên ku baweriya xwe bi yekîtiya sosyalîstan tîne û yên ku di vê rêyê de di nava hewildanekê de ne. Em ê di pêvajoya xebatên xwe de vatîni û berpirsiyariyên ku di vî warî de dikevin ser milên xwe bi cih bînin.

7) *Yekîtiya me ji ber realîteya dijwarî û pirrêhîtiya têkoşîna me ya ji bo rizgariya neteweyî û avakirina civateke demokratîk, şerê çekdarî jî di nav de, bikaranîna hemû navgînên têkoşîna siyasî pêwîst û meşrû dibîne. Ji ber vê yekê jî, li gor şertan, bi tevayî afirandin û bikaranîna navgîn û metodên ku pêwîstiya têkoşîna me pê heye, mercên pêşîn yê serkevtinê dizane.*

8) Yekîtiya me ji rastiya siyasî û dîrokî ya welatê me yê perçekirî hereket dike û hemû hêzên rizgariya neteweyî yên perçeyên din mutefîkên stratejîk yên şoreşa neteweyî û demokratîk ya Bakurê Kurdistanê dibîne. Herweha yekîtiya me baweriya xwe bi pêwîstiya koordînasyon û hevkarîyeke xurt ya di nava hêzên neteweyî yên hemû perçeyên Kurdistanê de tîne û ji bo pêkanîna vê yekê hewil dide.

9) *Pirsa yekîtiya tevgera rizgariya neteweyî ya Bakurê Kurdistanê pirseke pirrêhêl e û bi awa û sewiyeyên cuda tîr rojevê. Di vî warî de avakirina platforma yekîtiya neteweyî ya herî fireh ya hêzên welatparêz û demokrat, yek ji wan vatîni û pirsên ku ev pêvajoyê li ser me ferz dike ye. Yekîtiya me wê bi hemû hêzên Bakurê Kurdistanê re di nava pêwendiyêke baş de be û ji bo gavên ku di rêya yekîtiya fireh ya van hêzan de hatine avêtin li gor armanca xwe bi ser keve, vatîni û berpirsiyariyên ku dikevin ser milên xwe bi cih bîne.*

Wek ku tê zanîn, ji demekê û vir de ye ku di navbera Partiya me û RNK/KUK û TSK de ji bo yekîtiya siyasî û rêxistinî ya sosyalîstan pêwendiyên resmî tîr birêvebirin. Çarçoveya van pêwendiyên, di destpêka meha Nîsanê de, ji bo raya giştî bi beyanekê hatibû diyarkirin. Bê guman, ev yek ji bo me gaveke girîng û sedema serbilindiyê ye. Hersê rêxistinên, çarçoveya platform û xebatên xwe yên Yekîtiyê di "tesbîtên hevbeş yên Yekîtiyê" de bi neh xalan anîne zimên. Her wisa di wan neh xalan de, sedemên bingehîn yên xebata xwe ya hewildana yekîtiyeke fireh ya siyasî û rêxistinî ya sosyalîstên Bakurê Kurdistanê hatine diyarkirin.

Weke ku tê zanîn, partiya me bi xwe, encama Yekîtiyeke ku beriya du salan hatiye avakirin e. Partiya me avabûna xwe, di warê Yekîtiya Sosyalîstan de wek gaveke girîng qebûl dike. Lê li gel vê yekê jî, di Kongreya avakirina Partiyê de hat diyarkirin ku, bi avabûna YEKBÛN'ê, pêwîstiya yekîtiyeke firehtir ya hêz û kadroyên sosyalîst, ji rojevê derneketiye. Lewra divê YEKBÛN hewildanên xwe yên di vê derheqê de bi awayekî aktîv bidomîne da ku sosyalîstên Kurdistanê bê sedemên girîng di cih û rêxistinên cuda de belavbûyî nemînin; yekîtiya xwe ava bikin û hêzên xwe bikin yek da ku bikaribin di vê pêvajoya têkoşîna rizgariya neteweyî û demokratîk de rola xwe hîn baştir bi cih bînin. Platforma RNK/KUK, TSK û YEKBÛN'ê encameke berbiçav ya hewildana aktîv ya vê perspektîvê ye.

Bê guman ev qonaxa ku em îro gihastinê, bi hewildanên Partiya me bi tenê nedihatî bidestxistin. Ger RNK/KUK û TSK jî ji bo yekîtiyeke weha ne xwedî perspektîv û hewildaneke avakar bûna, di vê qadê de serkevtin çenedibû. Loma divê ev serketin, wek berhema encama bicihanîna berpirsiyariyên xebata ku li gora pêwîstiyên têkoşîna neteweyî û demokratîk, ji aliyê sê rêxistinên ve hatiye birêvebirin, bête ditin.

Partiya me, ji bo bi hemû hêzên ku pîrsa yekîtiyê di rojeva xwe de dibînin re munaqêşe bike, di meha 10'an 1993'yan de, di civîna Komîteya Navendî de dîsa di vê derheqê de biryar girt û bi beyanekê bangeke din kir. Her çend ev banga me, ji bilî pêwendiyên me yên sê alî, bê bersiv ma jî lê me hewildanên xwe nedan sekinandin. Her wisa, ji bo ku di vî warî de gavên firehtir bîr avêtin, platforma me ya sê alî -RNK/KUK, TSK û YEKBÛN- bi xwe jî ji bo vê pîrsê bangî KAWA, TÊKOŞÎNA SOSYALÎST û PRK-RIZGARÎ kir.

Avakirina yekîtiya rêxistinî û siyasî ya sosyalîstên Bakurê Kurdistanê, di esasê xwe de ne pirseke îdeolojîk e, pirseke programatik e. Platforma RNK/KUK, TSK û YEKBÛN'ê jî, li gor vê pêwîstiyê xebata xwe rêz kiriye û bi rêve dibe. Gavên ku tîr avêtin ji li gor vê pêwîstiyê tîr tesbîtkirin.

Xebata yekîtiya siyasî û rêxistinî ne karekî hêsan e. Lê him avakirina YEKBÛN'ê û birêvebirina xebata wê ya du salan û him jî platforma RNK/KUK, TSK û YEKBÛN'ê, diyar dike ku ev yek mumkun e. Serkevtina yekîtiyê, yekser tesîra xwe di têkoşîna neteweyî û demokratîk de diyar dike. Yekîtiyên firehtir, beriya her tiştî, bi tesbîtkirina vê pêwîstiyê mumkun e. Dîsa, him avabûna YEKBÛN'ê û him jî platforma me diyar dike ku, xebata yekîtiyê li pêşiya xebata rêxistinîyê, bi tu awayî nabe asteng.

Xebata yekîtiyê, ji me hemûyan; him ji rêxistinên ku di nav xebata vê yekîtiyê de ne û him jî yek bi yek ji hemû endam û dilxwazên van rêxistinên, fedakarî û hewildanê dixwaze. Em hemû, yek bi yek, bi hewildan û bi beşdariya xwe ya aktîf, dikarin him di warê fikrî de him jî di warê pratîk de rolên xwe bilîzin. Ango, biserketina vê xebatê ji me her yekî/yekê însiyatîvê dixwaze. Ev yek, bicihanîna berpirsiyariyeke grîng ya rêxistinî û siyasî ye ku bersiva pêwîstiyêke pêvajoya têkoşîna me ya rizgariya neteweyî û civakî dide. ■

Têkoşîna neteweyî û demokratîk ji bo bidestxistina desthilata siyasî ya li welatê me ye

Platforma Cepheya Neteweyî û Demokratîk ya Bakurê Kurdistanê, di 7-8-9 ê meha Nîsana 1994'an de civîneke din pêk anî. Di beyana ku ji bo raya giştî hatibû amadekirin de, encamên vê civînê bi awayekî giştî hatibû nivîsandin.

Wek ku tê zanîn, hêzên siyasî yên Bakurê Kurdistanê, ji bo avakirina cepheyeke neteweyî civîna xwe ya yekemîn di meha Hezîrana 1993'an de çêkiribûn. Lê wek ku tê zanîn "li gor

ku di vî warî de gelek gavên ber bi pêş de hatibin avêtin jî", Cepheyê, hîn ji resmîyeta xwe ya rêxistinî ya huqûqî wernegirtiye. Eşkere ye ku vê yekê, di raya giştî ya welatparêz de, gelek pirs peyda kirine. Gelo çima hemû hêz, di her fersenda ku heye de, li ser hewcedariya yekitiya hêzên welatparêz, ango pêwîstiya avakirina cepheyekê gelekî bi germî tiştan dibêjin, lê dîsa jî Cephe ava nabe?

YEKBÛN, ji dest pêkê de cîhê xwe di nav van peywendîyan de girtîye û beşdarî xebata avakirina Cepheya Neteweyî û Demokratîk ya Bakurê Kurdistanê bûye. YEKBÛN, dîtî û daxawzên xwe yên di derheqê avakirina Cepheyê de, di civînên ku heta nûha pêk hatine de bi awayekî pir vekirî diyar kirîye. Her wisa ev yek, bi awayekî nivîsandî, ji hemû hêzên ku beşdarî avakirina cepheyê bûne re jî hatine rêkirin. Hin aliyên van dîtî û daxwazan, pêwîst e ku careke din bîrê bibîranîn. **Wek ku di beyana civîna Komîteya Navendî ya Partiya me ya di 10.04.1994'an de ji hatiye diyarkirin, YEKBÛN, pirsê cepheyê, wek temsîliyeke siyasî ya di sewiyeya neteweyî de û wek bedêla iktidara gelê Kurd dibîne. Her perspektîf û pêşniyarên xwe jî li gor vê yekê amade dîke û dê**

amade bike. Ma ger pirs, ne pirsê iktidarê be, gelo em ji bo çî yekitiya hêzên welatparêz dixwazin? Ma gelo têkoşîna neteweyî û demokratîk ne ji bo bidestxistina desthilata siyasî ya li welatê me ye? Ma divê ev desthilata siyasî çî nede hemû hêzên welatparêz yên Bakurê Kurdistanê? Ji ber ku bersîvên Partiya me ji bo van pirsan

Partiya me, Partiya Yekbûyî ya Gelê Kurdistanê, dê hewildanên xwe yên ji bo avakirina Cepheyê Neteweyî û Demokratîk - ku ya bikaribe layiqî navê xwe be û her wisa rola xwe ya temsîliya siyasî ya di sewiyeya neteweyî de bi cîh bîne- bi îsrar bidomîne. Ji ber ku em baş pê dizanin û hem di bi gelek tecrubeyên ku di dîroka gelê me de hem jî yên di dîroka neteweyên bindest de baş diyar e ku em ê bê yekitiyeke weha nikaribin bi ser kevin û desthilatiya siyasî ya neteweyî û demokratîk li welatê xwe bi dest bixin û bidomînin. Lewra jî divê em endam, rêxistin û alîgirên YEKBÛN ê hem jî aliyê fikrî û hem jî ji aliyê xebatên pratîk yên ji bo avakirina YEKITIYEKE DÎ SEWIYA NETEWYÎ de, di her qada jîyanê de û li her deverê, şiyarbûna xwe ji dest bernedin.

pozîtîv in, em li pirsê Cepheyê jî wek ku li jor hatiye diyar kirin, dinêrin.

Mixabin, wisa xuya ye ku hemû hêzên ku beşdarî avakirina Cepheyê dibin, di vê xalê de bi tevahî ne zelal in. Wek ku carinan di çapemeniya Kurd de û di çapemeniya wan rêxistinên ku di vê derheqê de zelal in bi xwe de jî tê nivîsandin, pirsê cepheyê ji bo hinek hêzan pirsê taktîkî ye û rojên xwe pê derbas dîkin; yan jî ketine dû ku "pêşengiya xwe" bidin qebûlkirin. Ev dîtî û pêşniyarên wan hêzan, di warê encamgirtina ji xebatên Cepheyê de, ne

xwedî fonksiyoneke avakar in û xebatên platformê derengtir dixin. Her wisa, hîn ji di hinek xalên girîng yên avakirina Cepheyê fonksiyonel de ku me nave-roka wê li jor nivîsand, hin berjewendiyên rêxistinî yên beşdarên xebatên platforma Cepheyê, di warê encamgirtina ji vê xebata girîng de, astengan derdixin.

Mînakên van helwestên ne avakar, bi awayekî nivîsandî di çapemeniya Kurd de hene, lê pêwîst e ku ev yek li vir jî bîrê dubarekirin. Cephe, temsîla siyasî ya neteweyê Kurd e. Divê cephe bi vî awayî, bi pîvanên ji bo her aliyê civata welatparêz ya Kurd, zelal bê şirovekirin. Lewra mirov nikare li pirsê Cepheyê, wek yekitiyeke hêzên siyasî ku hew navên wan li teniştê hevdu, yan jî li bin hevdu bîrê nivîsandin, binere. Cephe, ji bo çareserkirina pirsê neteweyî û avakirina desthilatiya siyasî ya neteweyî û demokratîk ya Kurda li Bakurê Kurdistanê, yekitiyeke îradeya siyasî ya di sewiyeya neteweyî de ye. Ger bi vî awayî li Cepheyê bê nerîn, wê gavê hêzên neteweyî dê di xebatê hewildanên xwe de, bêtir nêzî encaman bibin.

Partiya me, Partiya Yekbûyî ya Gelê Kurdistanê, dê hewildanên xwe yên ji bo avakirina Cepheyê Neteweyî û Demokratîk - ku ya bikaribe layiqî navê xwe be û her wisa rola xwe ya temsîliya siyasî ya di sewiyeya neteweyî de bi cîh bîne- bi îsrar bidomîne. Ji ber ku em baş pê dizanin û hem di bi gelek tecrubeyên ku di dîroka gelê me de hem jî yên di dîroka neteweyên bindest de baş diyar e ku em ê bê yekitiyeke weha nikaribin bi ser kevin û desthilatiya siyasî ya neteweyî û demokratîk li welatê xwe bi dest bixin û bidomînin. Lewra jî divê em endam, rêxistin û alîgirên YEKBÛN ê hem jî aliyê fikrî û hem jî ji aliyê xebatên pratîk yên ji bo di SEWIYA NETEWYÎ de avakirina YEKITIYEKE , di her qada jîyanê de û li her deverê, şiyarbûna xwe ji dest bernedin. Ji bo peydekirin û xurtkirina dostaniya aliyên cuda yên siyasî, rêxistinî, civakî yên gelê Kurd, her hewildanê her xebata li her derê û di her warê têkoşînê de hem pêwîst e û hem jî xwedî roleke girîng e. Ev berpirsiyarî, yek ji wan berpirsiyariyên herî girîng yên vê pêvajoyê ye. □

Du saliya Yekbûnê li Swêdê hat pîrozkirin

Rêxistina Yekbûnê ya li Swêdê li gor biryara **Rêxistina Ewropayê**, di 13.05.1994-an de, li bajarê Stockholmê li "Konsertuset"ê du saliya **Partiya Yekbûyî ya Gelê Kurdistanê** pîroz kir. Propagandaya şevê di bin însiyatîva "**Komîteya amadekirina Şeva Pirozkirina Du saliya Yekbûnê**" de, berî mehekê dest pê kiribû. Rêxistina Yekbûnê ya li Swêdê ji bo vê şevê afîşeke rengîn çap kiribû û ev afîş li gelek deverên bajarê Stockholmê û hinek bajarên din yên Swêdê hatibû daliqandin.

Di salona Şevê de hemû hêz û weşanxaneyan pirtûkên xwe bi awayekî azad û di bin toleranseke fi-
reh de raxistin.

Şev ji du beşan pêk dihat; Beşa yekem ji axavtinan re û ya duyem jî wek konserê hatibû organîzekirin.

Ji bo vê şevê li gel du grûpên muzîkê çar hunermend hatibûn dawetkirin. Hunermendên ku beşdari şevê bûn ev in: **Şivan Perwer, Tehsîn Teha, Fûad Ehmed û Zahid Brifkanî**. Hunermend Fûad Ehmed "**Marşa Yekbûnê**" beste kiribû û di şevê de pêşkêşî guhdaran kir. Şev bi govenda "**Koma Şîlan**"ê ve hat vekirin û bi derketina herçar hunermendan ya bi hevdû re qediya.

Gelek rêxistinên siyasî û demokratîk ji Komîteya Amadekirina Şevê re mesaj şandin. Rêxistinên ku ji şevê re mesaj şandin ev in:

Komîteya Hevgirtin PDK ya Swêdê, Tevergera Têkoşîna Sosyalîst, **Partiya Demokrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyeyê**, Vejin Rêxistina Ewropayê, **Rêxistina Ewropayê ya Partiya Yekîtiya Demokrat a Kurd li Sûriyeyê "Yekîti"**, Partiya Çep a Kurd li Sûriyê, **KAWA liqê Swêdê**, Partiya Serxwebûna Kurdistanê, **PDK-Îran**, Nûnertiya Swêdê ya Partiya Rizgariya Kurdistanê, **Rêxistina Swêdê ya Partiya Demokrat a Kurd li Sûriyeyê (El-Partî)**, Komîteya Swêdê ya PDK-Yekgirtin, **Nûnertiya Swêdê ya PSK**, Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê, **Yekîtiya Jinên Kurdistanê li Swêdê**, Yekîtiya Ciwanên Kurd li Swêdê, Kovara **DÎDAR** (Organa Yekîtiya Ciwanên Kurd li Swêdê), **Federasyona HEVKAR li Almanyayê**, **YKDK**, **Komeleya Demokratên Kurd li Norweçê**, Kovara **NSÎBÎN**, **Komeleya Kurdistanê li Spangayê**, Komîteya **YEKBÛNê** ya li Bûlgarîstanê û **Komîteya Yekbûnê ya li Londonê**.

Li ser navê **Buroya Hukûmet û Parlamentoya Başûrê Kurdistanê li Swêdê Taha Berwarî** jî axavtinek kir.

Herdu rêxistinên ku bi Yekbûnê re li ser prensîpên yekîtiya siyasî û rêxistinî ya sosyalîstan li hev kirine; Rizgariya Neteweyî yên Kurdistanê (**RNK/KUK**) û Tevergera Sosyalîst ya Kurdistanê (**TSK**) mesajeke hevbeş dan Komîteya Amadekirina Şevê.

Berpirsiyarê **Rêxistina Ewropayê ya Yekbûnê** M. Kîper li ser navê Yekbûnê axavtinek kir. Axavtina M. Kîper di warê yekîtiyan de, wek nîşana samimiyyeta Yekbûnê hat nixandin.

Em hem mesaja hevbeş ya **RNK/KUK û TSK** û hem jî axavtina berpirsiyarê Rêxistina Ewropayê ya Yekbûnê li jêr diweşînin.

Ji Komîteya Şeva YEKBÛN'ê re

Hevalên hêja,

Em Rizgarixwazên Neteweyî yên Kurdistanê (**RNK/KUK**) û Tevergera Sosyalîst a Kurdistanê (**TSK**) şeva we bi dilgermî pîroz dikin û serketina we ji dil û can dixwazin.

Hevalên hêja,

Weke tê zanîn, tevergera rizgarixwaza neteweyî ya Kurdistanê di mercên gelek giran û di pêvajoyeke taybetî de derbas dibe. Ev rewşa girîng û taybetî, pêwîstiya xebat û têkoşîna rêxistinî û yekîtiyan bêtir derdixîne holê. Pêwîstiya tevergera rizgarixwaziya neteweyî ya Kurdistanê îro ji her demê bêtir ji rêxistineke xurt, nûjen û têkoşer ku bikaribe bi awakî xurtir mudaxeleyî pêvajoyê bike û pîrs û pîrsgirêkên li pêşîya tevergera rizgarixwaziya neteweyî ne, çareser bike, heye. Ji bo pêkanîna alternatîveke weha jî barê herî giran û berpirsiyartiya herî mezin dikeve ser rêxistinên siyasî. Lê bêguman, di vî warî de, vvatîni û berpirsiyarî dikeve ser milên her niştimanperwer û şoreşgerên Kurd jî.

Ji bo pêkanîna vê armanca girîng û pîroz, gavavêtinên hersê rêxistinên me (**RNK/KUK, TSK û YEKBÛN**) yên ji bo pêkanîna yekîtiyê siyasî û rêxistinî, xwediyê cîhekî zor girîng û taybetî ye. Lê em di vê baweriyê de ne ku divê ev xebat bi beşdariyên pêwîst bêtir berfireh û xurtir bibe. Ji bo vî tiştî jî hersê rêxistinên me di nava hewildaneke taybetî de ne. Em hêvîdar in ku wê ev xebatên yekîtiya siyasî û rêxistinî ji roj bi roj xurtir û berfirehtir bibe û alternatîva ku pêwîstiya tevergera welatê me jê heye, rojek berî rojekê pêk bê.

Em bi vê bîrûbaweriyê careke din şeva we pîroz dikin, bi gelek silavên germ û birafî serketin serfiraziya we dixwazin.

**Rizgarixwazên Neteweyî yên Kurdistanê
(RNK/KUK)**

**Tevergera Sosyalîst a Kurdistanê
(TSK)**

Axavtina berpirsiyarê Rêxistina Ewropayê ya Yekbûnê

“Hêz û welatperwerên Kurd mecbûr in ku di navbera xwe de konsensusekê peyda bikin”

**Xwişk û birayên hêja,
Mêvanên delal,**

Hûn hemû bi xêr û xweşî hatin şeva pîrozkirina du saliya Partiya me; Partiya Yekbûyî Ya Gelê Kurdistanê.

Bêguman, em pir zêdetir pê kêfxweş in ku em rojêke wilo girîng, bi dost û hevalên xwe re, bi nûnerên rêxistinên çar perçeyên Kurdistanê re pîroz dikin. Em bi vê yekê serbilind dibin.

Partiya me, YEKBÛN, beriya du salan, di van rojan de hatibû damezrandin. Îro em bi hev re du saliya damezrandina Partiyê pîroz dikin. Ma gelo pêwîst e, mirov salawexta damezrandina partiyê ku ev du sal in hatîye avakirin û du salan li gorî bîr û baweriyên xwe têkoşin daye, pîroz bike? Ji bo doza gelê Kurd xebata du salan, pîrê eşkere ye ku, ne xebateke gelekî dîr û dirêj e. Mirov dikare bipirse; çi dikare bê kirin? Ya jî YEKBÛN'ê çi kirîye?

Ev pirs di cîh de ne. Divê wek her hêzê, em jî xwe muhakeme bikin û jî vê muhakemeyê encaman derxinin. Lê bi destûra we be, ez dixwazim behsa xususiyeteka YEKBÛN'ê bikim. Yekbûn jî aliyê sê hêzan ve hat avakirin; Partiya Pêşeng a Karkerên Kurdistanê, Komeleya Azadiya Kurdistanê û Rizgarixwazên Neteweyî yên Kurdistanê- Baskê Sosyalîst.

Di serê gelean de şik hebû. Di serê dilxwazên van hersê hêzan de jî şik hebû: ma gelo wê yekîtiyê bê avakirin? Wê kemilandineke di nav endam û kadroyan de pêk bê? Ew wê li hev bikin? Ji ber ku kadro û hêzên siyasî ên Kurdan, bi salan behsa yekîtiyan kirine û daxwaza gelê Kurd anîne zimên. Lê di pratîkê de gelek zehmetî û problem derketine. Ji ber van sedeman jî, yek ji wan xebatên ku heta vê rojê jî bo yekîtiyê hatine meşandin jî bi ser neketine. Nebiserketina karên jî bo avakirina yekîtiyê, gelek caran bi xwe retêkiliyên hîn xerabtir anîbû holê. Ji ber vê yekê, ji bo hêz û kadroyên ku jî aliyê îdeolojîk û politîk ve wek hev difikirin, bi hev re xebatîrîn û avakirina yekîtiyan, karekî gelek zehmet e, lê ewqasî jî muhîm e. Wek hûn dizanin, di sala 1990'î de, di nav hêz û kadroyên Kurd ên sosyalîst de munaqeseya yekîtiya hêzên sosyalîst dest pêkir. Di encama wan dîtînan û munaqeseyan de PPKK, KAK û KUK-SE, gihastin bawerîya ku ew her sê hêz, dikarin yekîtiya xwe pêk binin.

Dema ku bawerîya kadro û rêxistinînan bi serketina karê

yekîtiyan nema bû, me wek YEKBÛN da xuyakirin ku, ger gelekî zehmet be jî, dema ku herkes jî aliyê xwe hewl bide, yekîtiyê dikarin pêk bînin û bînin meşandin.

Her çiqasî YEKBÛN beriya du salan hat avakirin jî, ew hêzên ku YEKBÛN avakirine û jî partiyê re bûn bingeh, xwediyê dîrokeke gelekî dirêj û serbilind in. Hîmê hersê hêzên ku YEKBÛN avakirine, di salên 1970'yî de hatin avêtin. Lê di esase xwe de, rehên wan û dîroka wan digihêje salên 1965'an.

Sala 1965'a, di dîroka têkoşîna neteweyî ya li Bakurê Kurdistanê de, cihekî dîrokî distîne. Piştî têkçûyînê serhildanên neteweyî yên li Bakurê Kurdistanê, demeke bêdengiyê dest pê dîke û ew pêvajoya heta salên 1960'an dom dîke. Di sala 1965'an de li Bakurê Kurdistanê, bi avakirina Partiya Demokrat a Kurdistanê Tirkiyeyê re, Kurd careke din xwe bi rêxistinî dikin û jî bo doza gelê Kurd careke din dest bi xebata siyasî ya rêxistinî dikin. Wek ku tê zanîn, ji sala 1970'yî û vir de, xebata rêxistinî hîn xurtir û gestir bû.

Tevgera gelê Kurd bi tevayî gihast qonaxeke nûh. Tevgera Kurd, hem jî aliyê kadro û hem jî ji aliyê kutlewiye, bû xwediyê bi hezaran şoreşger û têkoşeran. Her çiqas jî ber pirsên îdeolojîk û politîk, parti û grûpên din ava bûn jî, lê gelek kadro û serokên wan jî PDKT dihatin.

Mêvanên hêja;

Min xwest ku li vir bi kurtayî behsa dîroka xebata rêxistinî bikim û bala we bikşînim ser dîrok û pêvajoya hersê hêzên ku YEKBÛN ava kirine. Ez naxwazim li vir bi awakî dîr û dirêj li ser xebatên YEKBÛN'ê rawestim û pesnê wê bidim. Eger Partiya Yekbûyî ya Gelê Kurdistanê pesindayîn heq kiribe, divê gelê

Kurd, kadro û milîtanên gelê Kurd vê pesnê bikin. Partiya Yekbûyî ya Gelê Kurdistanê, çiqas xurt dibe, bila bibe, di karê xwe de çiqas biserketî dibe bila bibe, lê dema ku di rewşa neteweyê Kurd de guherandineke berbiçav nehatibe kirin; gava ku gelê Kurd di doza xwe de hîn jî ne biserketî be, mana wê ew e ku em jî wek parti di kar û xebata xwe de hîn jî ne serketî ne. Divê pîvan jî ji bo me hemûyan û bi taybetî jî ji bo parti û hêzên Kurd ev be.

Divê em wek prensîp, xebata xwe û pêşketina xwe bi partiyê Kurd a din re qet muqayese nekin. Divê em, xwe bi dijmin re, bi hêzên mêtîngêhkarî re muqayese bikin. Dema ku kar û xebatên me, ji ya wan baştir meşiya, gava ku em di têkoşîna gelê xwe de biserketin û me mafên xwe bi dest xistin, wê demê em biserketî ne. Wê demê dê heqê me yê xwe-pesinandinê jî hebe.

Mêvanên hêja;

Rewşa gelê Kurd li her çar perçeyên Kurdistanê li ber çavan e. Dijmin Kurd aliyên welatê me girtiye. Hêzên mêtîngêkar, ne bi tenê li ser beşê ku di bin destên wan de ye, lê dixwazin li ser beşên din jî xwediyê gotinê bin û li ser qedera milletê Kurd xwediyê biryarê bin. Gelê me li Bakurê Kurdistanê, di bin şertên pir dijwar de têkoşinê dide. Dijmin li dijî gelê Kurd bi hêzên xwe yên eşkere, yên bi dizî, hêzên taybetî û "gundparêzan" ve, şerekî gelekî eşkere îlan kirîye. Dewletê du rê dane ber Kurdan: ya Kurdistanê bê terkkirin û valakirin, yan jî wê Kurdan bi darê zorê derxîne serê çiyân. Polîtîkaya dewletê gelek eşkere ye ku ew dixwaze kurdistanê jî insanan vala bike. Li gor hejmarên resmî; heta îro 1000 gund hatine valakirin. Bi milyonan nufûsa Kurd jî Kurdistanê bar kirîye û çûye aliyê Anadolê. Dewlet dixwaze demografiya Kurdistanê

biguherîne û pîrsa Kurd bike pîrseke eqaliyetî. Şoreşger û welatperwerên Kurd ne bi tenê bi şev, lê ro nivro jî aliyê hêzên dewletê, ji mal û cihên karê xwe tîr revandin û kuştin. Rojê 5-6 cînaletên ku failên wan meçhûl in, tîr kirin. Li Kurdistanê îmkânên xebata sendîqa, komelayetî, siyasî û demokratîk hema hema nemaye. Ji bo dewletê hemû

şoreşger û welatparêzên Kurd terorîst in. Dewlet li Kurdistanê rêza qanûnên xwe jî nagre, nahêle ku li gor qanûnên wê jî tu xebat bê kirin. Dostên gelê Kurd, sosyolog û rewşenbîrên giranbûha İsmail Beşikçi û Fikret Başkaya û nivîskarê Kurd Ahmet Zekî Okçuoğlu dîsa jî ber pîrsa Kurd, di zindanan de ne. Ma jî wan kîjan terorîst bû? Dewlet jî bo Kovarên Kurdan, jî bo xwediyê wan kovaran û berpirsiyarên wan, bi dehan sal ceza dixwaze. Dewlet Medya Guneşî, Azadî, Ozgur Gundem û Hevdemê, bi milyonan pere ceza dike. Ji bo ev kovar û rojname jî aliyê maddî ve xesarên mezin bibînin, wan berhev dike û nahêle bêne firotin. Dewletê bi vê polîtîkaya xwe, hemû rê li ber Kurdan girtiye. Do partiya HEP'ê jî ber mesela Kurd hat qedexekirin, îro jî ji DEP'ê re li Dadgeha Qanûna Bingehînê dawe hatiye vekirin û dê DEP jî bê qedexe kirin. Destnedana (imuniteta) serokê DEP'ê û çar parlamenterên wê û parlamenterê Kurd Mahmûd Alinak hat rakirin û herşex parlamenterên Kurd hatin zindankirin. Em dawe dikin ku divê ev parlamenter rojek beriya rojekê bê berdan û vegezin ser karên xwe yên parlamenteriyê. Di qedexekirina HEP'ê û DEP'ê de gelek eşkere ye ku şaşî û kêmasiyên wan bi xwe jî rol lîstine; wan jî gelek argument dan destê dewletê. Lê van partiyan ev şaşî û kêmasî nekiribana jî wê dewletê dîsa bixwesta wan qedexe bikira. Îro Kurd dîsa jî bo avakirina partiyeke legal di nava xebatekê de ne. Wê helwesta dewletê li hember wan çibe, ew ê di rojên pêş de xuya bibe. Lê daxwaza me ew e ku Kurd bi hevdu re bikaribin partiyeke legal ava bikin û deriyê wê jî ji her welatparêzî/welatparêzê re vekirî bihêlin. Dema ku di nav partiyeke de şertên bi hevdu re xebatkirinê nemîne, divê hêzên Kurd rê li hevdu negrin û li dijî hevdu ne bêtolerans bin. Gelê Kurd di rewşeke wusa dijwar de ye ku pêwîstiya me Kurdan bi her Kurdê/Kurda welatperwer heye. Divê em tu kesî li derveyî vê xebatê nehêlin. Divê em tu welatperweran bi hinek îddiyên ku dê

dewlet pê kêfxweş bibe, îtham nekin. Bila dîtina me û metoddên me yên li ser şoreşa Kurdistanê û doza wê, cihê be jî. Ev ne qelsiyek e. Hêz û welatperwerên Kurd mecbûr in ku di navbera xwe de konsensusekê peyda bikin.

Hevalên hêja, mêvanên delal,

Piştî protokola PKK'ê û PSK'ê, di nav hêzên Kurd de proseseke nuh dest pêkir. Di nav hêzên Kurd de têkilîyên nuh hatin danîn. Par, di 29'ê meha Gulanê de hêz û partiyên Kurdan li sê(3) paytextên welatên Ewropayê meşên azadiyê amade kirin. Di wan meşan de, bi hezaran Kurd jî bo maf û doza gelê Kurd mil bi mil bi hevdu re meşyan. Doza mafên gelê Kurd kirin. Piştî wan meşan, kar û barê xebata cephe di nava 12 hêzên Kurd de dest pêkir. Ev xebata gihastîye qonaxa xwe ya dawiyê. Ji bo ku eniya neteweyî bikaribe ava bibe, bêlgeyên wek program û destûrê kêr zêde temam bûne. Astengên herî mezin yên li pêşiya me, bîr û bawerî bi hev neanîn e, di karê muşterek de fedekarî nîşanedayin e;

rexnegirtina bi zimanê ku feydeyê nade gava me ya muşterek û armanca me ya salan û etîketên subjektîf li hev xistinê ye.

Ev jî di têkilîyan de pêvajoyeke nuh dixwaze; jîbîrkirina dijminatîya bi salan dixwaze; nîşandayina nefsbîçûkbûyîne dixwaze.

Em ê wek Partiya Yekbûyî ya Gelê Kurdistanê-Yekbûn, di vî warî de, çî ji destên me bê, çî fedekarî para me bike, bi cih bînin da ku dijminatîya nav hêzên Kurd bi şûn de neyê û dostanî û biratîya me hîn xurtir bibe.

Mêvanên hêja,

Partiya YEKBÛN'ê di kongreya xwe ya yekîtiyê de, bi-ryarek girti bû. Me gotibû ku: Ev yekîtiya me gavek e, dest-pêkek e; me sê hêzan jî bo yekîtiya sosyalîstan gavek avêt. Lê divê ev gav li vir nivçe nemîne, bê domandin. Me li ser vê biryara xwe, xebat û têkilîyên xwe bi hêzên Kurd re domand. Wek hûn jî dizanin ev qederê salekê ye ku têkilîyên me bi KUK û TSK'ê re heye. Ev têkilî û xebat îro gihastîye merheleyeke gelekî bilind ku wê di rojên nêzik de berheman bide. Xebata me ya muşterek hatiye ser xala destûr û programê û munaqesheyên li ser wê. Ez hêvî dikim ku em dê di rojên ne pir dûr de, mizgîniya vê yekîtiyê bidin gelê xwe, dost û hevalbendên xwe.

Mêvanên hêja

Îro li Kurdistanê Başûr rewşeke taybetî peyda bûye. Gelê me li ser axa xwe azad û serbilind dijî. Hêzên mêtîngêkar jî bo ku Dewleta Federe ya başûrê Kurdistanê jî holê rakin, civîn li ser civînan pêk tînin. Dijminên gelê Kurd hewil didin ku li Başûrê Kurdistanê bê îstîqrarî peyda bikin da ku hêzên Kurd bi hev bikevin. Di vî warî de car car dijminên gelê Kurd bi ser jî ketine. Divê em destkevtên ku li Başûrê Kurdistanê û yên li perçeyên din yên welatê me hatine bidest-xistin, biparêzin û lê bi xwedî derkevin. Em wek YEKBÛN'ê statuya ku li Başûrê Kurdistanê peyda bûye, destkevtê xwe qebûl dikin. Ji bo ku ev statu bi ser keve, çî ji destên me bê, em ê texsîr nekin.

YEKBÛN hemû hêz û partiyên her çar perçeyên Kurdistanê wek birayê xwe qebûl dike û bi wan re bi her awayî dixwaze biratî û dostaniya xwe pêş de bibe.

Ez jî sipasiya we hemûyan dikim ku hûn hatin vira û beşdarî şeva şahîya damezrandina du saliya partiya me bûn û em tenê nehiştin. Ez hêvî dikim ku em ê bi hevdu re şeveke xweş bibuhurînin. ■

Dîsa Şerê Birakujiyê

Komîteya Pêwendiyên ya RNK/KUK, TSK û YEKBÛNê bi munasebeta şerê birakujiyê yê ku li Başûrê Kurdistanê di navbera herdu hêzên mezin PDK- Yekgirtin û Yekîtiya Niştimanî Kurdistan de hate holê, civiya û şer, wek helwesteke li dij berjewendiyên tevgera rizgariya neteweyî û demokratîk nixand û lênerîna xwe ya li ser vî şerî, ji bo raya giştî bi daxuyaniyekê diyar kir. Yekbûn-Info vê daxuyaniya muşterek ya hersê hêzan, ji bo xwendevanan li jêr diweşîne

JI RAYA GIŞTÎ RE

Di destpêka meha gulanê de, li Kurdistanê Başûr, di nava hêzên PDK-Y û YNK de şerekî nû dest pê kiriye. Ev şer, "Şerekî Birakujiyê" ye û helwestek li dijî menfaetên tevgera rizgarîxwaziya neteweyî ya Kurdistanê ye. Sedem çî dibin bila bibin, ev şer nayê qebûl kirin. Divê gelê Kurd û rêxisinên wî yê siyasî û demokratîk bi hemû hêz û îmkânên xwe li dijî vî "Şerê Birakujiyê" rawestin û mahkûm bikin. Divê em bi tu awayî piştgirî û alîkariya hêlekê nekin û ji bo rawestandina vî şerî û pêçandina birînen nû bi helwestek serbixwe hewl bidin.

Bi awakî giştî, tevgera rizgarîxwaziya neteweyî ya Kurdistanê di pêvajoyeke gelek taybetî û qonaxeke zor girîng de derbas dibe. Dijminên Kurdistanê bi hemû hêz û

îmkânên xwe êrişî ser tevgera Kurdistanê dikin û bi awakî hevbeş listik û planên nû li dardixînin. Îro bi gelek awan şerekî dijwar û piralî di nava gelê me û dijminên wî de dom dike. Gavavêtinên şaş ji bo dijminên me kês û firsendên bê biha derdixîne holê. Mafê tu hêzê tuneye ku kês û firsendên weha bidin destên dijminên Kurdistanê. Ne gelê Kurd û ne jî dirok dê şaşî û gunehên weha efû nekin. Tirs û xofa me ev e, ku ev "Şerê Birakujiyê" yê li Kurdistanê Başûr dest pê kiriye, kês û firsendên weha têxin destên dijmin û bidestxistinên ku li vî perçeyên Kurdistanê ku gelê Kurd bi dest xistine

têk ve bive.

Ji ber van hoy û sedeman, em Rizgarîxwazên Neteweyî Yê Kurdistanê (RNK/KUK), Tevgera Sosyalîst ya Kurdistanê (TSK) û Partiya Yekbûyî ya Gelê Kurdistanê (YEKBÛN) vatinyek neteweyî dibînin ku nerîn, daxwaz û pêşneyarên xwe yê di derheqê vî şerî de bidin diyar kirin:

1) Ev şerê ku li Kurdistanê Başûr, di nava hêzên PDK-Y û YNK de dest pê kiriye, "Şerekî Birakujiyê" ye. Sedem çî dibin bila bibin, ev şer şaş e û nayê qebûl kirin. Divê ev şer bê qeyd û şert derhal bê rawestandin.

2) Divê di vî "şerê Birakujiyê" de tu hêz û rêxisinên niştimanperwer yê Kurdistanê alîgiriye nekin. Divê hêzên siyasî û avayiyên demokratîk yê Kurdistanê û hemû pêşverû welatparêzên Kurd bi hemû hêz û îmkânên xwe li dijî vî "Şerê Birakujiyê" rawestin û ji bo rawestandina vî şerî bi helwestek serbixwe hewl bidin.

3) Weke her civatê, di civata Kurd de jî gelek pirs û pîsgirêk hene û wê hergav pirsên nû jî derkevin holê. Destavêtina çekan di tu demê de nebûye dermanê çareserkirina pirsên weha. "Şerê Birakujiyê" di tu demê de pirs û pîsgirêk civatî û siyasî yê gelê Kurd çareser nekiriye û her gav birînen nû di canê gelê Kurd de vekiriye.

Divê pirs û pîsgirêkên hene bi awa û metodên aşîfî çareser bibin. Ji bo kulturêk weha di nava civat û rêxisinên me de geş û xurtur bibe, diyar e ku hîn ge-

lek vatinyên taybetî dikevin ser milên me.

4) Divê di şerî de hêzên siyasî yê Kurdistanê Başûr rêz û hurmeta Hukûmeta Federe ya Kurdistanê bigrin û çareserkirina pirs û pîsgirêkên civatê bispêrin Hukûmetê û muesesên wê. Di birêvebirina Kurdistanê Başûr de, divê bi rastî hemû selahiyet û desthilatî di destên Hukûmeta Federe ya Kurdistanê de bin.

5) Divê li Kurdistanê Başûr, merc û zemîna rakirina hêzên çekdar bête amade kirin û teva hêzên çekdar yê PDK-Y û YNK însiyatîfa hemû hêzên çekdar têkeve bin kontrola Hukûmete Federe ya Kurdistanê. Herweha pêva-

Ji bona pêçandina birînen vî şerî û pêkanîna zemîna baweriyêke nû, divê bi gelek awayan xebat û hewldanên taybetî bête tespît kirin û meşandin.

Em hersê rêxistin, careka din gazî serokatîya PDK-Y û YNK dikin û ji wan daxwaz dikin ku vî "Şerê Birakujiyê" derhal rawestînin. Ji bo rawestandina vî "Şerê Birakujiyê", bê guman vatîni û berpirsiyartîya herî mezin li ber deriyên serokatîya PDK-Y û YNK de ye.

joya damezirandina "Artêşa Neteweyî ya Kurdistanê" bête geş kirin.

6) Ji bona pêçandina birînen vî şerî û pêkanîna zemîna baweriyêke nû, divê bi gelek awayan xebat û hewldanên taybetî bête tespît kirin û meşandin.

Em hersê rêxistin, careka din gazî serokatîya PDK-Y û YNK dikin û ji wan daxwaz dikin ku vî "Şerê Birakujiyê" derhal rawestînin. Ji bo rawestandina vî "Şerê Birakujiyê", bê guman vatîni û berpirsiyartîya herî mezin li ber deriyên serokatîya PDK-Y û YNK de ye. Lê divê hemû rêxistin û avayiyên niştimanperwer yê Kurdistanê û kesên pêşverû û welatparêz jî di vî warî de bédeng nemînin û vatîni û pêwîstiyên dikevin ser milên xwe pêk binin. Bi helwestek serbixwe û bêalî ji bo rawestandina vî "Şerê Birakujiyê" em dikarin roleke mezin û taybetî bilîzin. Di vî warî de çî bikeve ser milên me hersê rêxistin, em dê bi awakî serbixwe, bêalîgiriye û weke vatinyek neteweyî pêk binin.

20ê Gulanê 1994

Banga Hêzên Kurd û Kurdistanî

Komîteya Hevkariya Hêzên Siyasî yên Kurd û Kurdistanî li Swêdê, ji bo rawestandina şerê birakuji di 12.05.1994-an de li Stockholmê civiyan û piştî civînê serokê Parlamentoya Kurdistanê Başûr Namiq Cewher Salim û serokatiya herdu hêzên mezin yên şer dikin re mesajek şand. Em ji ber girîngahiya vê bûyerê, mesaja Komîteya Hevkariya Hêzên Siyasî yên Kurd û Kurdistanî li Swêdê, ji bo xwendevanên "Yekbûn-Înfo" yê li jêr diweşînin. Yekbûn-Înfo

Ji birêz

Serokê Parlamentoya Kurdistanê Başûr Birêz Namiq Cewher Salim,

Serokatiya Yekîtiya Niştîmanî Kurdistan

Serokatiya PDK-Yekgirtin re

Îro gelê Kurd di pêvajoyeke dîrokî re derbas dibe. Li dinyayê, him çavên dostan him jî yê dijminan li ser me ye. Gelê Kurd, di hemû beşên Kurdistanê de, bi tevayî di rewşeke pirr hesas de dijî. Lê pirsê Kurd li dinyayê, li gor doh, îro êdî aktueltir e. Bo çareserkirina pirsê Kurd, hukûmet û dezgehên din yên Ewropayê û yên gelek welatên din, li ser munaqeşeyê û gengeşiyên dikin. Bi taybetî li ser rewşa Kurdistanê Başûr ku piştî xebata bi 10'an salan û bi 10 hezaran şehîdan, Parlamentoya Kurd hilbijartin û Hukûmeta Federal a Kurdistanê Başûr çêkirin. Gelê Kurd, li Kurdistanê Başûr bo hemû cîhanê da xuyakirin ku dikare xwe îdare bike û dikare bi baştirîn şîweyê azadî û demokrasîyê li welatê xwe bi cih bike û biparêze. Ew rewşa hanê li cîhanê pir bi pozîtîf hate şirovekirinê.

Lê pir mixabin ku ev bûyerê birakuji ku li Kurdistanê Başûr cryan daye û hîn jî dom dike, ew baweriya ku rêxistinên Kurd yên

Kurdistanê Başûr dabû gelê Kurd û dostên xwe yên derva hêdî hêdî dişkinin. Pêwîst e bê gotin ku ev bûyerê hanê, bi tevayî gelê Kurd û bi taybetî jî rêxistinên Kurd yên siyasî û dezgehên wan ên demokratîk û her wisa dostên gelê Kurd jî ji kûr va êşandîye û pir xemgîn kirîye. Qet şik tune ye ku dijminê me jî bi bûyerên weha şa dibin, ji xwe cehd û daxwazên wan jî ev e ku her tim Kurd bi Kurd bidib kuştin.

Em, Komîta Hevkariya Hêzên Siyasî yên Kurd û Kurdistanê li Swêd, ji vî şerê birakujiyê ra nerazibûna xwe carek din jî didin xuyakirin û bangê terefan dikin ku berjewendîya netewa Kurd li pêş hemû tiştî bigirên, pirs û problemên xwe bi rêya diyalog û bi metodên demokratîk û aşîti hal bikin.

Vî şerê hanê ya birakujiyê NUHA rawestînin, ku sibe dereng nebe!

Komîta Hevkariya Hêzên Siyasî yên Kurd û Kurdistanî li Swêdê

PDK-Îran, PSK, YKN, Hevgirtin-PDK, PDPKS, PDKY, YEKBÛN, PDKY-Sûriyê, RNK-KUK, KAWA, AL Partî-Sûriyê, Tekoşîna Sosyalîst, PRK-Rizgarî, TSK, PÇK-Sûriyê)

1'ê Gulanê roja têkoşîna gelê bindest e jî

YEKBÛN, KUK û TSK li Fransayê bi hevdû re beşdarî meşa 1'ê Gulanê bûn û li ser 1'ê Gulanê beyanek pêşkêşî raya giştî kirin. Hersê hêzan di beyana xwe de wiha dibêjin: "Roja 1'ê Gulanê ne bi tenê rojê navneteweyî ya têkoşîna karkir û kedkarên e herwisa roja jî bi rizgariya gelên bindest jî rojê yekîti û têkoşîne ye. Ji ber vê yekê 1Mê Gulanê jî bo me, hêzên neteweyên Kurdistanê rojê girîng e. Divê dema ku em ber bi salên 2000'î ve diçe de, mafên mirovan û yên neteweyan hîn jî di bin lîngan de ye. Tirkiyê di nav koma Ewropayê de ye û vê awantaja dewletên mezin bi kar tîne. Li Parlamentoya Ewropayê car carna jî bo mafên mirovî li Tirkiyeyê bal bê kişandin jî, lê di refdariyên Tirkiyeyê de tu guhertên çênabe. Piştî girtina parlamenterên DEP'ê pirsê Kurd dîsa derket sahneya navneteweyî. Li tevê jî casareta hukûmeta Tirkiyê ya ku bikaribe pirsê Kurd bîne ser maseyê, nîne. Her çî dibe bila bibe, ew naxwaze vê pirsê munaqeşeyê bike"

Beyan li ser cinayetên qesasnediyar jî radiweste û wiha dibêje, "Divê çî bête kirin? Li hember vê rejîma durrû ya ku xwe mîna dewleteke huqûqê û dostê welatên Ewropayê dizane, çî dikare bê kirin?"

COGRAFYAYA TÊKOŞINA SIYASÎ TUNE YE

Li welatên Ewrûpaya rojava, ji ber sedemên cuda, li gora texmînan, nêzî milyonek Kurd bi cih bûne. Pirraniya Kurdên ku li Ewrûpaya rojava dijîn, ji Kurdistanê Bakûr in û li Almaniyayê bi cih bûne. Her wisa divê bê gotin ku pirraniya van Kurdan, ji ber sedemên "aborî" hatine van welatan.

YEKBÛN (Partiya Yekbûyî ya Gelê Kurdistanê) partiyeke ku li Kurdistanê Bakûr hatiye avakirin û ji bo azadî, demokrasî û wekhevîyê têdikoşe. Xebatên YEKBÛN-ê weke rêxistineke siyasî û sosyalîst ya Kurdistanê, li her derên dinyayê ji bo pêkanîna van armancan e. Lewra ji berpirsiyariya her endamêkî/endameke YEKBÛN-ê li her derên dinyayê, divê xurtkirina vê têkoşinê be. Ev têkoşin ji bo hilweşandina nîrê kolonyalîst û dagirkeriyê, ji bo avakirina welatekî azad û civateke demokratîk û wekhev tê birêvebirin. Armanç û awayên têkoşina partiya me jî di program û destûra wê de hatine diyarkirin.

Bê guman, ev têkoşina ku partiya me bi rêve dibe, ji bona ku Kurd bi xwe li welatê xwe bibin iqtîdar-desthilatdarê siyasî-ye. Ev yek eşkere ye ku bi tenê li ser axa welatê me mumkun e. Ango, em bi tenê dikarin li welatê xwe bibin iqtîdar, ne ku li welatên xelkê.

Lê gelek caran armancên têkoşina siyasî û cografyaya têkoşina siyasî tîn tîvlihevkin. Bi taybetî jî di van salên dawî de, hema bûye wek "adetek" e xirab ku dema mirov ji bo wan hêjahî û armancên xwe yê siyasî li derveyê welatê xwe jî têdikoşe, tê gotin ku "dema em li welêt ne xurt bin, li derveyê welêt nikarin tiştêkî bikin. Her tişt bi hundirê welêt ve girêdayî ye". Tesîra wê dîtîne, gelek caran mirovan dixwe rewşeke pir pasîv. Ev dîtîna hem ji aliyê naveroka xwe ve xelet e û hem jî ji aliyê şikil û netîceyên xwe ve xetereke mezin e. Em dikarin sedemên vê yekê, di bin çend xalên de rêz bikin.

1- Têkoşina siyasî beriya her tiştî, têkoşineke ji bo bîr û baweriyê ye, pîr-seke bi hêjahî û fikrên siyasî ve girêdayî ye û bi tu cografyayêke siyasî, yan jî etnîk ve nikare bête girêdan. Eger wisa be, weke mîsal, ne hewce ye ku em ji Almanan, ji Swêdiyan, yan jî ji Fransîzan doza piştigirî û alîkariya mafên gelê xwe û têkoşina azadiya welatê xwe bikin. Ne pêwîst e ku parlamentereke/parlamenterekî Alman yan jî rojnamevanekî/rojnamevaneke Îngilîz di derheqa têkoşina gelê me de, xwedî helwesteke pozîtîv be, lewra ew li Kurdistanê najîn!

2- Ger em bi tenê van sîh salên daw-

iyê yê dîrok û têkoşina gelê xwe, weke esas bigrin, dîyar e ku -ne tenê ji bo me Kurdan, her wisa ji bo her tevgerêke ji welatên kolonî û dagirkerî, yan jî dîktatorî- xebatên li derveyê welêt her tim xwedî fonksiyoneke gelek girîng bûn. Em kurdên "vê demê" nikarin xwe ji vê rastiyê dûr bixin. Têkoşina iqtîdarê li welatekî weke Kurdistanê û li civateke weke ya Kurdan, ne tiştên abstrakt (soy-ut) in. Pêwîstiya têkoşinê, bi kadro, bi malîyeteke xurt, bi dezgehên agahdarî û propogandayê, bi piştigirî û alîkariya navneteweyî heye. Pirraniya van tiştên ku hatin binavkirin, dikarin li derveyê welêt û bi xebatên kadroyên li derveyê welêt bîn bicîhanîn.

Bê guman, ev têkoşina ku partiya me bi rêve dibe, ji bona ku Kurd bi xwe li welatê xwe bibin iqtîdar-desthilatdarê siyasî-ye. Ev yek eşkere ye ku bi tenê li ser axa welatê me mumkun e. Ango, em bi tenê dikarin li welatê xwe bibin iqtîdar, ne ku li welatên xelkê.

3- Têgêreke siyasî divê li her derê xurt bibe. Mirovên di nav xebata siyasî de, nikarin li hêviya xurtbûna li cografyayêke taybetî bisekinin. Çawa ku Kurdên li Diyarbekirê nikarin bibêjin ku tevgera welatparêz ya li Erzeromê yan jî ya li Elezîzê ne xurt e û ji ber vê yekê divê em li bende xurtbûna tevgera welatparêz, yan jî xurtbûna YEKBÛN-ê ya li wan deveran bisekinin, her wisa, ku şikil û awayê xebatê ji ya welêt cûda be jî, divê Kurdeki/Kurdeke welatparêz nebêje ku ez ê li Londra, li Parisê, li Kölnê û li Stockholmê li hêviya biserketîna tevgera welatparêz, yan jî li hêviya xurtbûna YEKBÛN ê li welêt bisekinim. Li vir pîrsa me, endam û dilxwazên YEKBÛN-ê ye. Divê em li tu devera, li hêviya hevdu nesekin. Li her devera ku em lê dijîn, gelek karên ku em dikarin bikin hene û divê em li her deverê hewil bidin ku em û

dîtînen me bibe xwediyê piştigiriyêke xurt.

4- Xaleke din ya girîng jî ev e ku, di têkoşina siyasî de, bîr û baweriyên siyasî divê weke bîngeh bîn girtin. Bê guman, her rêxistineke Kurdan ji bo Kurdan têdikoşe. Bi her xeletî, yan jî bi her rastiyên xwe ve, her rêxistinên ku navê Kurd yan jî Kurdistanê li ser in, realîte-rastiyêke-welatê me ye. Lê her rêxistineke siyasî xwediyê program, bîr û bawerî, şiklê xebatê û avahiya rêxistinîyêke cuda ye. Divê her Kurdeke/Kurdeki welatparêz di van cudabûnan de mafê hîlbijartinê bide xwe û xwe bi tenê bi dengê "xurtbûnê" ve girênde. Di dîroka gelê Kurd de, li her perçeyên Kurdistanê li gora demên xwe -ji tevgera Şêx Ubeydullah û vir de- gelek tevger û rêxistinên xurt hebûne û dîroka me nîşanî me dide ku "xurt" bûn bi serê xwe bi tenê, tîra biserketin û xelasbûnê nake!

5- Ev dîtîna ku li jor hat diyarkirin û gelek caran em di jiyana xwe ya rojane de rû be rû dibin, mirov bixwazê-nexwazê dibe sedem û bîngeha pasîvbûnê, bêçaretîyê û lewra jî bi tu awayekî xizmeta têkoşina azadiya welatê me nake.

Weke ku li jor di bin çend xalên de hatin diyarkirin, ew dîtîna ku, "li derveyê welêt tiştêkî nikare bête kirin", divê bi her awayî bête mehkûmkirin. Endam û dilxwazên partiya me YEKBÛNê, divê bi her îmkanên xwe ve, hem xwe û hem jî der û dora xwe jî dîtînek wisa bi dûr bixe. Yê ku "dibê-jîn her tişt bi xebatên li welêt ve girê-dayî ye" jî hêz û îmkanên xwe bi xebatên xwe yê li derveyê welêt re her tim xurttir kirine û îroj jî dikin.

Wek ku me li jor jî dîyar kir, ev têkoşina ku partiya me bi rêve dibe, ji bona ku Kurd li welatê xwe, bi xwe bibin desthilatdarê siyasî ye. Di vê manê de, helbet hertişt bi têkoşina ku li welêt tê meşandin ve girêdayî ye. Ango têkoşina welêt dê netîceyê tayîn bike. Lê ger em li derveyê welêt ji bo alîkariya propaganda, dîplomasi, madî û kadroyan xebateke xurt nekin, têkoşina li welêt dê çawan xurt bibe? Dîtînen wek, "dema ku em li welêt xurt ne bin, em li derveyê welêt nikarin tiştêkî bikin" mahneyên pasîvîzmê û kar nekîrî-nê ye. Divê endam, alîgir û dostên me yê li derveyê welêt, bi dîtîna "ger em li derveyê welêt xurt bibin, dê tevgera li welêt jî hîn xurttir bibe, hereket bikin.

Ji bo eşkerekirina durûtiya Tirkiyeyê xebatên muşterek pêwîst in

Tevgera neteweyî û demokratîk ya gelê me di qonaxê girîng re derbas dibe. Êrîşên dewleta Tirkiyeyê yên ji bo valakirina Kurdistanê, xurttir û firehtir dibin. Artêşa Tirkiyeyê di bin navê ji ortêrakirina "terorizmê" de, li gel hêzên din yên nîv-mîlîter, gelê Kurd daye ber xwe; gund û bajarên wêran dibe û li Kurdistanê deverên jiyane xalî dihele.

Li aliyê din jî, tevgera neteweyî-demokratîk ya gelê Kurd li bakûrê Kurdistanê hîn jî yekîtiyêke siyasî ya ku bikaribe di sewiyeya neteweyî de gelê me û tevgera wê ya neteweyî temsîl bike, ava nekiriye. Weke tê zanîn, xebata "platforma Cepheya Neteweyî û Demokratîk ya Bakûrê Kurdistanê" ev salek e ku dest pê kirîye, lê her çend gelek gav hatibin avêtin jî, karûbarên di vî warî de, hîn jî nehatiye qedandin. Ango, xebata avakirina Cepheyê hîn xelas nebûye.

Çi ji aliyê van êrîşên dewletê ve be û çî jî ji aliyê tevgera neteweyî ve be, lê rewşa ku heye û bi kurtî li jor hat binavkirin, divê bibe bingeha tesbîtkirina awa û perspektîfên xebata me. Li derweyî welêt, bi kêmanî di vî warî de em dikarin çî bikin, bi kê rê van xebatan bikin û çawa van xebatan birêve bibin, ji bo xwe zelal bikin.

Berî her tiştî, di rewşê weha de, Kurdên welatparêz divê karibin bi kêmanî li derweyî welat ji tevgera neteweyî ya gelê me re, ji bo mafên bingehîn yên neteweyî û mirovî, ji gelê Kurd re piştgirîyeke xurttir û firehtir peyda bikin û xebata xwe bikin yek. Lê eşkere ye ku, ji bo ku yekîtiya xebata welatparêzan karibe bê ava kirin, divê berî her tiştî bê zanîn bê li ser kîjan perspektîfan yekîti dikare bê ava kirin. Divê ev bî zelal kirin.

Dewleta Tirkiyeyê, îro di qada navneteweyî û di peywendiyên nav dewletan de, di tengasiyêke pir mezin de ye. Ev tengasî ji ber wan peymanên ku Tirkiye bi xwe imze kirine, lê di warê mafên neteweyî yên gelê me de naxwaze li gor prensîpên ku di van peyma-

nan de hatine diyarkirin, bimeşe, derdikeve. Biryarên KEHE (Konferansa Ewleyî û Hevkarî ya Ewrûpayê) yek ji wan peymanên ku di gelek platformên navneteweyî de Tirkiyeyê dixwe tengasiyê ye.

Li derweyî welêt, di xebat û peywendiyên me yên li gel dezgeh û rêxistinên wan welatên ku em lê dijîn de, çî di warê propogandayê de çî jî di xebat û peywendiyên pratîk de "qebûlkirina realîteya Kurd bi hemû mana û garantiyên xwe yên huqûqî ve" ji bo xebatên hevbeş yên welatparêzên Kurd li derweyî welêt, dikare bibe bingehê. Bê guman ev yek ne ji bo partiya me û ne jî ji bo tevgera neteweyî ya Bakûrê Kurdistanê bi awayêke giştî nayê wê maneyê ku em ji hedefên xwe yên siyasî û yên programatik gawên paş diavêjin. Na, ev yek beriya her tiştî jî bo eşkerekirina durûtiya dewleta Tirkiyeyê ji her tiştî zêdetir imkan dide me, lê her wisa ji bo di xebata pratîk de hêz û kesên welatparêz bi awayekî herî fireh bigihîne hev, dikare bibe bingehê jî.

Rêxistinên partiya me, endam û alîgirên partiya me Partiya Yekbûyî ya Gelê Kurdistanê, divê di bin ronahiya vî perspektîvê de, bi xebat û têkoşîna xwe ya programkirî ya li derweyî welêt û bi taybetî jî ya li welatên Ewrûpayê bikaribin vî karî xurttir bikin. Ev yek ji aliyekî ve dê bibe xebateke bi berhem ya rêxistinên partiyê, lê her wisa dê ji bo civandina potansiyela neteweyî ya li derweyî welêt jî roleke mezin bilîze. **Gelo, xebata hevbeş, ne di wan xalên ku em ji hev cuda difikirin de, lê di muşterekên herî fireh de, ne yekkirina xebat û hêzên me ye? Kesê ku nexwaze "realîteya Kurd" li gora peymanên navneteweyî - weke misal, li gora Peymana Parisê ya KEHE ya 1990'î-meşrûlyet û garantiyêke huqûqî bigre heye?** ■

YEKBÛN...

tu kesan, "berjewendiyên" xwe yên grûpî di ser yên giştî re negirtin û hesabên biçûk nekirin. Armanca hemûyan serkevtîneke hevbeş bû. Loma jî berî ku her sê hêzên bûn bingehên YEKBÛN'ê werin kongra yekîtiyê, xwe belav kirin û bi vî awayî hatin kongreya yekîtiyê. Samîmiyet diyar bû, herkes ji fedekariyê re amade bû û vî jî hêviyên ji bo sekevîtinê xurttir dikir. Di bin vî atmosferê de di warê bidestxistina îmkanên misogeriya serkevtîne de, gaveke ku hêvî jê diçûrîsi dihat avêtin.

Bê guman ev fedekarî û hewildanên ji bo bicîhanîna vî berpirsiyariyê, li ser bingehê bawerîyêke xurt hatibû avakirin. Ev bawerîya xurt û xwestina xebata di vî warî de, ji ber têgihiştina rewşa welêt û her babet vatîniyên şoreşgerî bûn. Ev têgihiştin, dibe garantiya demokrasiya di nav partiyê de jî. Tiştê ku îro jî YEKBÛN'ê xurttir dibe, ev bawerîya xurt, xwestina xebatê, têgihiştin û bawerîya bi demokrasiyê ye.

Serkevîna kongreyê, di dîroka sosyalîstên Kurdan de gaveke girîng e. Vê gava girîng metoda Kurdan ya hewildana ji bo avakirina yekîtiyan guherand. Beşdarên kongreya YEKBÛN'ê, xwe li ser niqteyên bingehîn konsantre kirin û niqteyên ku divê di pêvajoya xebatê de bêne çareserkirin, wê asteng dernexistin pêşîya vî gavê. Ev helwest ji bo avakirina partiyêke ku bikaribe bersiva hewcedariyên têkoşîna neteweyî û demokratîk bide û bi awayekî pirrêhêl mudaxleyî pêvajoyê bike, îmkanin nûn anîn holê.

YEKBÛN bi serkevîna avabûna xwe re, rêya yekîtiyên hîn firehtir jî vekir; ji bo partî û hêzên nêzîkî xwe, bû avabûneke balkêş û hevrê. Partiya me Partiya Yekbûyî ya Gelê Kurdistanê ji aliyekî ve hewildanên xwe yên ji bo yekîtiya sosyalîstên Kurdistanê didomîne û ji aliyê din ve jî bi hemû hêzên ku berjewendîya wan di şoreşa neteweyî û demokratîk ya Kurdistanê de heye re, ji bo di sewiyeyêke herî bilind de avakirina platformeke neteweyî tedi-koşe.

Yekbûn di vî warî de, bi perspektîvên xwe, bi xebata xwe û bi gawên xwe yên pratîk ve bawerîyêke xurt daye hawirdorên siyasî. Parastin û pêşdebirina vî bawerîyê, berpirsiyariya her endamekî/endameke Yekbûnê ye.

Pîrozkirina du saliya Yekbun'e



◆ Şivan
PERWER



◆ Tehsîn
TAHA



◆ Zahid BRIFKANÎ



◆ Fûad EHMED

◆ *Axaftin*

◆ *Folklor*

◆ *Def û zirne*

Cih/Plats : Konserthuset (T) Hötorget

Dem/datum: 13/5/1994

Saet/tid : 17.00